Newroz **Hejmar (76) Rûpel (7) Ç.Pêşîn 2007z – 2619k**

Sersaxî

Bi navê kovar,nivîser û xwênerên wan,bi navê hemî rewşenbîrên Kurd li Binxetê,em sersaxî û serxweşiya malî,malbat,dost,heval,dezgehên rewşenbîrî û rewşenbîriya Kurd li welêt û dervî welêt,bi koçkirina dawî ya rewşenbîr û romannivîsê Kurd,nemir Mihemed Uzun,dikin.

Ji ber ku nemir Mihemed Uzun kuldarê çareserkirina pirsa gelê xwe bû, beşekî mezin ji jiyana xwe di ber gelê xwe û pirsa wî de terxan kir. Hewil da,ku gelê xwe serfiraz, di ristika gelên cîhanê de cihgirtî , bibîne.Loma,di gelefeka jiyanê de,nemir Mihemed Uzun, berê xwe da çand û hunera Kurdî,da wê mijara nasnameyî,ya ku di riya wê re dikare gelê xwe bi gelên cîhanê bide nasîn ,bike karê xwe yê sereke.Ew karê,ku roj bi roj şûna xwe, bi banbilindî ,di toteya navnetewî de digirt û dibû neynika dêrîniya gelê Kurd.

Hêviya me ji xwedanê jorî ew e,ku nemir Mihemed Uzun bi dilovaniya xwe şa bike ,di buhuştê de bihêwirîne û kulên ku bi şûn xwe de hiştin bi cih bîne.

***Kovar û rewşenbîrên Kurd li Sûriyê**
*** Kovara Aso**
*** Weşana Deng**
*** Kovara Gulistan**
*** Kovara Gelawêj**
*** Kovara Jîn**
*** Weşana Newroz**
*** Kovara Pirs**
*** Kovara Perwan**
*** Kovara Vîn**
*** Kovara Roj**
*** Weşana Ziman**

***Komîta çalakiyên Kurdewarî Qamişlo**
11.10.2007

****

Di18-10-2007 an de. Li ser riya bajarokê Şiyê, di bûyereke tiranfêlê de, xortê hetdesalî, Baran kurê mamoste Mihemed Delî jiyana xwe ji dest da. Roja dî, bi beşdariya xwedî, dost û hogiran, li gorstana bajarokê Şiyê tê veşartn. Li ser gornê, xewndekarek gotinekê , bi zimanê dê pêşkêş dike.

Silav û rêz ji xwediyên rehmet, gundiyên Şiyê û ji beşdarên li sre vê goristanê re….

Îro rojeke reş û tarî ye ji me tevan re , îro xemgîniyek pir giran bi ser me de hatiye , îro qederê perdeyeke reş di ser me re girtiye , ji ber ku , xortê me yê hêja û li ber dilên me tevan buha , ewê weke guleke rengîn ji gulên buhara şiyê û kurdaxa dil bi şewat . Xwendekarê pola yazdan , di buhara temenê xwe de , ***BARAN DILÎ*** , bi bûyerek kambax û giran , li ser riya bajaroka Şiyê , qederê nav me bir û destên me wî ji hev qetandin .

Baranê çardesalî yê hêja û delal , tu xortekî nûgîhayî , jîr , hişmend , di xwendina xwe de jêhatî û nû bi temen û jiyana xwe şadibû , tu ziyante negihîştibû tu kesî , lê barkirina te bi vî rengî û div î temenî de , dilêş û ziyana metevane .

Birayê hêja ….

Xişma te ne bes xişma xwedî merivû gundiyên te ye , ew xişma me hemiyane û bi taybetî ya xwendekar û xortên kurde

Bi dilekî xemgîn û çavên ziwa , bi navê xwendekarên kurd li Helebê em serê xwedî meriv û gundiyên Şiyê sax dikin . Sebir û aramiyekê ji dê û bavê re dixwazin . Û buhişta firdosê jêre hêvî dikin ***Xwendekarên Heleb.***

Di dûre, apê Baran, bi navê malbatê, bi devikî sipasiya beşdaran dike û dibêje "Xweda tu teliyan negêne we .. serê we tevan sax be".

Bi navê karmend û xwendevanên Newrozê, em serê xwedî û hemû xwendekaran sax dikin